# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (282):

## Kuştina ciwanekî negîhayî, pakrewanbûna xort û temenmezinekî, mirina temenmezinekî ji qehra re, lêxistina xortekî negîhayî bi kêrê, ferekirina Gundê "Besme" yê niştecîkirinê, girtinin, pevçûn û qutkirina darina







Piştî ku binpêkirin û tewanên ku bi rengekî fere li Efrînê têne kirin hatin cersandin û riswakirin, û raporên mafwerî û ragîhandinî yên cîhanî li ser hatin belavkirin, û zêdebûna kerb û şermezarkirinê di dû tewana ciwanê Kurd ê negîhayî re li Cindirêsê, Turkiyê hewil da ku bandora bûyera dawiyê sivik bike û wêneyeke erênî bide dagîrkirina xwe ji herêmê re, ji ber wê istîxbaratên wê hemî milîseyên li herêmê agahdar kirin ku divê îsal şahiyên Cejna Newrozê neyêne qedexekirin, û giştînameyên "vêxistina agiran û lidarxistina şahiyan" ji keyan/mixtar û nûkeran re bi riya odeyên Watsapê hatin rêkirin/şandin, lê bi ser dilgermiya Kurdan ji bo vejandina cejna xwe, dîsa jî ew ne pir şad û kêfxweş bûn, û beşekî mezin ji wan di agirdadan û şahiyên ku milîseyan serpereştiya wan dikir de beşdar nebûn, bi sedema berdewamkirina qirêjiyan di dermafê wan de, peydabûna heyamên perçifandin û kelkelê, tunebûna asa aramiyê û bêbaweriyê bi Destlatên Dagîrkeriyê; Û li nav Bajarê Efrînê rûdanên şahiyane tune bûn, û herheft encûmenên xwecihî dûrî pêngavên hatine avêtin bûn, û Kurd bi cejna wan pîroz nekirin weke çawa pûtûpêdan daye "Bîranîna Şoreşê" û hatina meha "Rojiyê" pîroz kiriye.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Kuştina ciwanekî negîhayî:**

Li roja Çarşemê piştî nîvro/îkindî 13.03.2024. Z, piştî ku bi fen bire çandingeha "Hec Ibrahîm" li ser riya Gundê Tilsilorê - Başûrê Bajarê Cindirêsê ya ku malbata kujer ji sala 2018an. Z ve dest daniye ser û tê de rûniştiye, "Yamên Ehmed Ibrahîm" ji xelkê Navça "Sincarê" - Idlibê rabû bi lêdana deh derbên kêrê ciwanê Kurd ê negîhayî "**Ehmed Xalêd Me'imo**/Malbata Medê /16/sal" şerjê kir, û termê wî di bîra avê ya çandingehê werkir; Û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" ragîhandin ku wan kujer girtiye.

Û li gor zelalkirina xwediyên kuştiyê vêguneh, bavê wî ji heyvekê ve kujer "Yamên" ji karê di nanpêjgeha xwe de qewitandibû, û tu pevçûn an dijmantî di nav herdiwan de tune bû; Û hûrgiliyên tewanê diyar dikin ku tewan bi mebest û rijdeke pişinde û bi pilan hatiye kirin, û gûmanê çêdikin ku bêtirî kesekî tê de pişikdar/beşdar bûye.

Kujer gihîştî ye û nêzîkî Milîseyên "Nûr El'dîn Zenkî" ye, û gûman heye ku wî di nav refên wê de -weke leşker- kar dikir, û ev salix ji ser hate rakirin da ku li pêş dadgeha leşkerî netê dadgehkirin, û bo Hepsa "Maratê" ya navendî hate guhestin, û dê û bav û birayên wî jî di cihekî nenas de hatin veşartin.

Û xelkê Cindirêsê û Efrînê û tevahiya Kurdên Sûriyê li hundir û derve nûçeya şehîdbûna "Ehmed" ê negîhayî bi xemgînî û şermezarkirineke pir mezin pêşewaz kir, û bi hezaran ji wan di oxirkirina termê wî û xwepêşandanên pirotestokirinê yên gelek welatên Ewropî de pişikdar bûn; Û piştî derxistina termê wî ji bîrê, Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" girseya xwepêşandêran ji pêş biryargeha xwe bi avêtina qurşînan bi ezmên de û karanîna bombeyên dûmanî ji hev belav kir.

**= Pakrewanbûna temenmezinekê:**

Li 09.03.2024. Z, Artêşa Sûriyê û hevalbendên wê Gundê "Kibêşînê" - Çiyayê Lêlûn ya ku Milîseyên "Feyleq El'şam" desteser dikin topebaran kir, ji ber wê avêjtekin li maleke gund û makînak biçûk e hilgêran ketin, û di encamê de temenmezina Kurd "**Erîfe Cimo Heyder** /70/sal" şehîd ket, û hin din jî "Heyder Ebdo Heyder/80/sal, Cim'e Ebdo Heyder kurê Heyder/30/sal, Erîfe keça Cim'e Heyder/9/sal" bi awakî têvel birîndar bûn.

**= Pakrewanbûna Xortekî:**

Li 17.03.2024. Z, di encama topebarankirina Artêşa Turkiyê û milîseyên wê ji derdora Bajarê Tilrif'etê re - Bakurê Sûriyê (yê tijî koçberên zorane yên Efrînê), xort "**Elî Ebid El'rehman Mihemed** /18/sal" ji xelkê Gundê "Gemrûkê" - Navça Mabeta şehîd ket, û Hemwelatî "Mihemed Sebrî Xalêd /44/sal" ji xelkê Gundê "Qopê/Hemşelekê" - Navça Reco birîndar bû.

**= Mirina temenmezinekî ji kerba re:**

Piştî ku Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" temenmezin "**Arêf Umer Mihemed** /65/sal" ji xelkê Gundê "Eşûnê" - Navça Bilbilê agahdar kir, ku divê destê xwe ji ser "rezê tirî" yê birayê xwe yê zorane koçberbûyî rake, bi ser ku wî ji şeş salan ve bi rêve dibir û vêrgî jî didan, ji ber wê bi celta ket, û li 02.03. 2024. Z jiyana xwe ji dest da.

**= Lêdana ciwanekî negîhayî bi kêrê:**

Li êvara Înê 15.03. 2024. Z, giropeke xortan ji anîndeyan bi kêrê li lingê ciwanê Kurd ê negîhayî "**Rodî Mihemed Çeqel** /16/sal" ji xelkê Bajarê Cindirêsê xist, li Kolana vêlat - Bajarê Efrînê, Taxa ku Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" têde çalak, û ew di nexweşxaneyekê de hate dermankirin.

**= Ferekirina Gundê "Besme" yê niştecîkirinê:**

Li 10.03.2024. Z, "Komela Destên Sipî/Cemiyit El'eyadî El'beyda'i" vekirina /80/perçemalî/şiqe yên niştecîbûnê yên nû -di nav pirojeya Gundê "**Besme**" yê niştecîkirinê yê nimûneyî de- ragîhand, û komelê li 09.09.2023. Z belav kir, ku wê ji dema destpêkirina pirojeya Gundê "Besme" ve, avakirina /30/ yekîneyên niştecîbûnê = 360 perçemalî/şiqeyî bi dawî kiriye, û ta niha kar tê de berdewam e, û bi pereyên "Komela jiyankirina bi rûmet/El'eyş bîkerame - Felestîn 48", a ku hesabekî xwe ji bo komkirina alîkariyan li ba Bengê "Hapo'alîm/Hapoalim" ê Isra'îlî vekiriye.

**= Girtinine bêsûcane:**

**Destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

- Ji dora heyvekê ve, Hemwelatî "**Ebdela El'ferec kurê Reşîd** /55/sal" û kurên wî "**Ehmed, Reşîd, Ebid El'rehman, Ebdo** - zarokekî pola şeşê" ji pêkhateya Ereb/Gundê "Tiltewîlê" - Bakur Rojavayê Bajarê Efrînê, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" ve, bi tewanbariya/tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, û ta niha bêsûcane girtî ne; Herweha jî milîseyan dest danî ser "makînakê, tirektoreke çandiniyê, kilfetoreke ajotinê û du matorên dutekerî" yên malbatê.

- Li 20.03.2024. Z, Hemwelatî "**Şahîn Sefer Seydo** /45/sal" ji xelkê Gundê "Kosa", bi behaneya pevçûnekê di navêna kurên wî û kurên anîndeyekî di dibistana gund de, li ser neradestkirina wî vêrgiya zêtê zeytûna ji berpirsiyarê gund re - Milîseyên "Feyleq El'şam", û bo navenda Navça Bilbilê hate birin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li êvara 22.03.2024. Z, pevçûnin di navêna du giropên çekdar ji Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" de derketin, di encama nelihevkirinê li ser belavkirina malina di pirojeya "El'emel 2" ya niştecîkirinê de/Çiyayê Turindê, cîgeha derbasgeha Bakur ji Çandingeha "Gobelê" ya girêdayî Gundê "Cilbirê" - Robariya, û di encamê de endamek hate kuştin û sisê din jî birîndar bûn.

**= Binpêkirinine din:**

- Li 14.03.2024. Z, anîndeyin ji Bajaroka "Encarê" (Gundewarê Heleb ê Rojava) /8/ darên gûzê yên temen bêtirî /25/salan, yên Hemwelatî "Necîb Nûrî" ji Gundê "Gewrika" - Navça Cindirêsê, yê ku Mlîseyên "Firqit El'hemzat"desteser dikin, ji bo êzingkirin û bazirganiyê qut kirin.

Zincîra tewanên lêxistina bi kêran ji ciwanên Kurd re di navboriya kêmtirî heyvekê de, asta kîndarî û zikreşiya ku di nav hêzên Dagîrkeriya Turkiyê û Milîseyên Sûrî û civaka derdorê de belavkirî aşkere dike, û armanc jê çêkirina veçekandinekê û peydakirina tirs û xofekê ji Kurdan re ye, ji bo koçberkirina zaro û kêmrûmetkirina wan.

23.03.2024. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Pakrewanê ciwan ê Kurd ê negîhayî "Ehmed Xalêd Me'imo/Malbata Medê", Cindirês 13.03.2024. Z.

- Kujer "Yamên Ehmed Ibrahîm".

- Topebarankirina G."Kibêşînê" - Çiyayê Lêlûn, Pakrewana temenmezin ya Kurd "Erîfe Cimo Heyder" û yên birîndar "Heyder Ebdo Heyder, Erîfe Cum'e Heyder".

- Pakrewanê ciwan ê Kurd "Elî Ebid El'rehman Mihemed", Til'rif'et 17.03.2024. Z.

- Birîndar "Mihemed Sebrî Xalêd", Til'rif'et 17.03.2024. Z.

- Temenmezinê Dilovanber "Arêf Umer Mihemed".

- Birîndarê negîhayî "Rodî Mihemed Çeqel", 15.03.2024. Z.

- Ferekirina G. "Besme" yê niştecîkirinê yê nimûneyî, vekirina /80/ perçemalî/şiqe yên niştebûnê, 10.03.2024. Z.